


İNCİL

Saxlem e!



Prof.Dr.F.F. Bruce
Müjde Yayıncılık

İncîl

Saxlem e

Prof. Dr. F. F. Bruce

Müjde Yayıncılık Ltd. Şti
Vişne Sok. 4/11
Kadıköy-İstanbul

Navnîşana xwestinê:

P. K. 8 Acıbadem
Kadıköy-İstanbul

ISBN 975- 7889- 90- 3

Prof. Dr. F. F. Bruce, D. D., F. B. A., Brîtanya
Çapa pêşîn bi navê ‘The New Testament is
Trustwoothy’ hatiye kirin

Em minet û sipasiyên xwe pêşkêşî Birêvebirê British Museum
a London, Pirtûkxaneya John Rylands a Zanîngeha Manches-
ter, Pirtûkxaneya Vatîkan û Kollekciyonâ Mansell a London
dikin ku derfeta bikaranîna wêneyêni di vê broşurê de, dane
me.

Mafê çapê parastî ye.

Kurtış Ofset Matbaacılık

2001 İstanbul

Naverok

PÊSGOTIN.....	4
1. <i>Încîl</i> (Peymana Nû) û naverok.....	5
2. Tekstên <i>Încîlê</i> yêñ destnivîs.....	8
3. Her çar beşên pêşîn ên <i>Incilê</i> û şahadetiya wan a ji Îsa re.....	12
4. Zimanê <i>Încîlê</i>	25
5. Lîsteya pirtûkêñ ku <i>Încîlê</i> pêktînin kengî pêk hat?.....	28
6. <i>Încîl</i> çawa ji ali Xwedê ve hat peyxamkirin?.....	33
7. Armanca <i>Încîlê</i>	36

PÊSGOTİN

Ji bo kesên ku baweriya xwe bi Mesîh anîne çavkaniya esasî ne Încîl e, Mesîh Îsa bixwe ye. Mesîh Îsa, Kelam an Peyva ku ji eslê Xwedayê Mezin tê bixwe ye (*Binêre Încîl: Yûhenna 1:1-18*) Lê çavkaniya me ya sereke ya di derheqê Mesîh Îsa, mizgînîya ku anîye û fikrên wî de, Încîl e. Încîla ku ev serê 2000 salan e hatiye nivîsîn û bi hesasiyeteke mezin hatiye parastin, bi sedan salan e ku li hemberî tevger û êrîşen dijwar diberxwe dide. Hê Mesîhê ku di Încîlê de cih digire û hîndariyêñ ku ji Xwedê peyxam distînin, ji bo mirovêñ ku birçîtiya ruhî ya nûjen dikşînin teze û weke ava zelal e. Erê, peyyêñ rasteqîn ên Xwedayê qadirê mutleq li gor wext û zeman nayêñ guhertin; ji bo her demê pêdivî û bifêde ne.

Ev kitêboka ku em niha pêşkêş dikan, bi awayekî zanistî û bi kurtebirri dîrok û nivîsîna Încîlê ravedike. Armanca me, îro gava ku hûn rahêjin Încîlekê û bixwînin, divê hûn zanibin ku hûn Încîla di sedsala yekemîn de hatiye nivîsîn û mirov pê ewle ye dixwînin; bi xwendina Încîlê, em dua dikan û dixwazin ku hûn jiyanekî bi hezkirina Xwedayê Mezin tije derbas bikin.

“Ez (Mesîh Îsa) ji bo ku mirov bibin xwediye jiyanê, jiyanekî dûr û dirêj hatime dinyayê.” (*Încîl: Yûhenna 10:10*)

1. İncîl (Peymana Nû) û Naveroka Wê

Beşê diwem ê Pirtûka Pîroz¹ Încîlê (*Peymana nû an ahda nû*), dewama *Peymana Kevin* a ku, him Cihû, him jî bawermendên Mesîhî (Kesênu ku baweriya wan bi Mesîh têne) qebûl dikin e. *Peymana Kevin* a ku ji *Tewrat, Zebûr û pirtûkên Pêxemberan* pêk tê, ji bo hatina Îsayê rizgarker amadekirina dinyê ji aliyê Xwedê ve rave dike; Încîl jî, nîşan dide bê ka çawa ev soz bi alîkariya Îsa hatine cîbicî kirin.

27 besên Încîlê hene. Carinan ji her beşek ji çar beşen pêşîn (*Metta, Markos, Lûka, Yûhenna*) re jî Încîl tê gotin. Încîla ku tê maneya “Nûçeya baş” an “Mizgînî” yê di eslê xwe de ne pirtûk e: Mizgîniya rizgarkirina dinyê ya ku Xwedê bi alîkariya Îsa şandiye dinyayê ye. Ji ber ku bi tevayî jî *Peymana Nû*, vê mizgîniyê bikitekit rave dike li gellek welatan bitenê weke “Încîlê” tê zanîn.

Îsa Mesîh, Wî bixwe tu pirtûk nenivîsîne. Pirtûka Pîroz a ku Wî bikar ankiye, berhevoka nivîsên Îbranî ye ku jê re *Peymana Kevin* (*Tewrat, Zebûr û hwđ.*) jî tê gotin. Weke ku Îsa gellek caran gotiye, *Peymana Kevin*, daxwiyanîya xwedan desthilat a ku Xwedê ji însanan re şandi ye. Îsa

¹ Pirtûka Pîroz (Kîtab-i Mukaddes) ji *Tewrat, Zebûr û hwđ.* ku jê re tê gotin (Ahda Kevin an *Peymana Kevin*) û Încîl ku jê re tê gotin (Ahda nû an *Peymana Nû*) pêk tê. *Peymana Kevin* ji 39 beşan, *Peymana Nû* ji 27 beşan pêk tê.

da fêmkirin ku ji bo pêşbîniyêن *Peymana Kevin* pêk bîne, hatiye dinyayê. Weke nimûne gava ku Ew dibêje, “Çimkî Kurê Mirov (mebesta wi ew bi xwe ye) jî nehatiye ku jê re xizmet bê kirin, lê hatiye ku xizmetê bike û di ber gelekan de canê xwe berdêl bide” (*Încil:Markos 10:45*). Yeşaya² digot ku “Evdê Xwedê” yê ku di pirtûka pêxember de bahsa wî dibe Ew bixwe ye. Îsa Mesîhê evd ê ku Yeşaya bahsa wî dike, bi gorîkirina canê xwe di ber gellekan de xizmeta xwe temam kir, bi vî awayî gunehê însanan hilgirt û derfeta ku ew li huzûra Xwedê xwe ji gunehêن xwe pak bikin, pêk anî (*Tewrat:Yeşaya 52:13-53:12*). Her weha, piştî mirin û vejiyana Îsa, kesên ku baweriya xwe pê tanîn ev yek weha ïlan kirin: “Gunehê herkesê ku baweriya xwe bi Îsa anîbe wê bi navê Wî bêن efûkirin” (*Încil:Karêن Şandîyan 10:43*).

Piştî ku Îsa ji şagirtêن xwe veqetiya bi demeke kurt, ew lê hay bûn ku huzûr û qeweta wî bi awayekî din, di civîn û jiyana wan a şexsî de pêk hatiye. Berî çûna Îsa ya ezmanan, hate bîra wan ku Wî ji wan re gotiye ew ê hêzeke Xwdayî jê bigrin û bi vê hêzê jî ew ê karibin bibin şahidêن Wî li dinyê. Îsa, çavkaniya vê hêzê weke “Ruhê Rastiyê” yan jî “Ruhê Pîroz” binav kir; ji şagirtêن xwe re got ku ew ê ji wan re bibe “*Paraklîtos*” ek ango, “Alîkar,” “Şîretker,” (“Tesellîker”). Ji wan re got ku, “Alîkarê ku wê Bav li ser navê min bişîne, ango Ruhê Pîroz, wê her tiştî fêrî we bike, hemî tiştêن ku min gotiye bîne bîra we... Ruhê Pîroz,

² Ango Îşeya

wê berê we bide her rastiyê. Ew ê ji ber xwe ve nepeyive, bitenê tiştên ku bihîstiye wê bêje û tiştên ku wê li pêşerojê bibin wê ragihêne we” (*Încil, Yûhenna 14:26; 15-26-27; 16: 13*).

Ravekirina jiyana Îsa û tiştên ku fêrkiriye, di beşê Încîlê yê *Karêن Şandîyan (Resûlan)* de dom dike. Di vî beşî de, di derheqê hatina Ruhê Pîroz ê Îsa û pêkanîna sozên ku dabûn de gellek delîlên me hene. Li wir piştî vejîna Mesîh Îsa ya di Roja Pênciyan (Roja Pentekostê) de hatina Ruhê Pîroz tê ravekirin. Kesên ku baweriya xwe bi Îsa tînin, di bin rêberayetiya Ruhê Pîroz de bûn şahidên esehî yên hêza rizgarker a Îsa û mizgîniya di derheqê wî de ji Qudusê hete Romayê li hemî welatên Deryasipî belav kirin.

Ji kesên ku mizgîniya Îsa li navçeya Deryasipî gerandin ê herî girîng Pavlosê Tarsûsî ye. Ew, ne yek ji şagirtên Îsa yên pêşîn bû; berevajîya wê, wî li Qudusê û hawîrdora wê bi dijwarî zilm li bawermendên Mesîhî dikir û dixwest civata wan ji navê rake. Lê Pavlos piştî ku diçe Şamê, di encama tecrûbeyeke îlahî de, piştî ku baweriya xwe bi Îsa tîne, dibe parêzerê herî mezên ê “Baweriya” ku berê dixwest ji navê rake. Ji ber ku mizgîniya Îsa belav dikir, Pavlos pirr zor û zehmetî dît, demeke dirêj di zindanê de ma û di encamê de Piştî Zayînê (P.Z.) di sala 67 an de serê wî hate jêkirin û hate şehîd kirin. Sêzde ji beşenî *Încîlê* nameyên ku Pavlos nivîsî ne û beşekî girîng ê çîroka jiyana wî di beşê *Încîlê* yê *Karêن Şandîyan* de hatiye keyd kirin. Bi saya xebata Pavlos riya Mesîh Îsa li dinya Pagan³ mutlaq bû û di encamê de (Piştî mirina Pavlos bi 250 salî)

Xiristiyanî, bû dînê resmî yê Împeretoriya Romayê. Pavlos, sedî sed yek ji kesên herî girîng û jêhatî yênen Enedolî ye.

2.

Tekstê Destnivîsî yê Încîlê

Ji sala 1920î û vir de pirtûkxaneya Zanîngeha John Rylands a li bajarê Birîtanya yê Manchester, xwediye kopyayek beşek ji besen Încîlê yê herî Kevin ê ku hete iro hatiye dîtin e. Ev beş kopyayek ji kopyayêن Încîlê yê ku di salên 130 - 140î yê P.Z. de, ango bi tenê pişfî 50 salên nivîsandina qismê Yûhenna hatiye nivîsin e. Ji ber ku pir biçûk bûye, bitenê karibûye beşekî biçûk ê tekstê *Yûhenna* bigre. Lê dîsa jî qet nebe dikare tiştekî bi qasî ku karibe Îsbat bike ku *Yûhenna* wê demê jî hebûye û ji ciyê ku pêşî lê hatiye nivîsin ber bi ciyên pirrî dûr ve belav bûye, biparêze. Ji ber ku beşê Încîlê yê Yûhenna li bajarê Efesê yê nêzîkî Îzmîrê hatiye nivîsin, lê kopya wê ya ku perçekirî bûye li Misrê hatiye dîtin.

Papîrus, malzemeyekî herî Kevin ê nivîsinê bûye ku ji qamîşekî pirr li besta Nîlê şîn dibû, pêk hatiye. Ji ber ku

³ Pagan: Pûtperestê pirr xweda ku baweriya xwe bi yek Xwedayî netanî

erzan bû pirr bikar dihat, lê mixabin gellekî diberxwe nedida; li ciyên hêwî zûka diriziya. Ji ber vê jî nivîsên papîrus ên ji demêñ kevin de mayî, bitenê li ciyên ziwa, bi taybetî jî di qûmêñ Misrê de hatiye parastin û karibûye hete dema me bê.

Li pirtûkxaneya Bodmer a ku nêzîkî bajarê Cenev ê Swîsreyê ye koleksiyoneke pirr girîng a pirtûkêñ papîrusî heye. Du kopyayêñ Kevin ên nivîskarêñ *Încîlê* yêñ dawiya sedsala duwem a P.Z. jî di nav vê koleksiyonê de ciyê xwe girtine. Ji van ya yekem kopyayeke *Yûhenna* ye. Ji sê paran du parêñ vê kopyayê temam in, ji sisiya yekê wê jî perçê perçê ye. Kopya duwem, temamê her çar besêñ pêşîn ên *Încîlê* ye, lê ji ber ku riziyane niha bitenê besê duwem ê Luka û besê yekem ê *Yûhenna* pêk tîne. Di nav koleksiyona Bodmerê de, kopyayek papîrus a nameyêñ Petrûs û Cihûda jî cîh digre. Ev kopyaya ku aîdê salêñ 200î ye, niha li pirtûkxaneya Vatîkan a Romayê ye. Ji ber ku gava Papa Paulê VI. di sala 1969an de çû Cenevê, M. Bodmer ev nivîs pêşkêşî wî kirine.

Berhevokeke din a papîrusêñ *Încîlê* ya girîng jî li pirtûkxaneya Chester Beatty ya li paytextê Ìrländayê Dublinê ye. Sîr Alfred Chester Beatty, di sala 1931an de bi van papîrusan re çend destnivîsêñ hin pirtûkêñ din jî bi dest xistine. Ev sê pirtûk in. Ya yekemîn ku di navbera salêñ 200 / 250 yên P.Z. de hatiye nivîsîn, bi temamî her çar besêñ *Încîlê* yêñ pêşîn (*Matta, Markos, Luka, Yûhenna*) û tekstê Grekî yê besê

Karêن Şandiyan e. Ya diwem ku P.Z. di salên 200î de hatiye nivîsîn ji 9 nameyêن Pavlos û nameya wî ya ji bo *Îbraniyan* e; ya sêyem, ku di navbera salên 250 / 300î de hatiye nivîsîn jî ji Peyxamê pêk tê. Ev pirtûk jî ji ber ku riziyane niha ne temam in. Ya ku herî baş hatiye parastin kopyaya ku ji nameyêن Pavlos û nameya wî ya ji *Îbraniyan* re pêkhatiye ye; ji 104 rûpelên wê 86 rûpel hîn jî mewcûd in. Ev pirtûkê destnivîs ên Chester Beatty, di sedsala sisiyan a P.Z. de li Misrê ji aliyê komeke Grekîaxêv, ku baweriya wan bi Mesîh dihat ve bikar hatiye anîn. Ev tekst aîdê Pirtûka Pîroz (ango *Tewrat*, *Zebûr*, *Încîl* bi hev re) e, ku berê diviya hemî temam bûna.

Niha di destê me de, çi bigire bi tevahî, çi bigire bi besî, tekstêن *Încîlê* yên ku di navbera destpêka sedsala duwemîn heta destpêka sedsala şazdemîn bi Grekî hatine nivîsîn, ji 5.000-î zêdetir nusxê hene. Ji vana ya herî girîng û ku biqîmet e, ya di navbera sedsala çaremîn û pêncemîn de hatiye nivîsîn e. Bi taybetî jî ji vane ya ku li Londonê ye, di sedsala çaremîn de, ji aliyê Kodeks Sinaitikus⁴ ve hatiye nivîsîn û ya hema bibêje di eynî tarîxê de ji aliyê Kodeks Vatîkanus ve hatiye nivîsîn û li Romayê ye piir girîng in. Mebihûrbilî bahsa papîrusên destnivîs ên sedsala duyemîn û sêyemîn kir, ji ber ku ev

⁴ Kodeks Sinaitikus: Nusxeya destnivîs a *Încîlê* ya ku li dêra çiyayê Sînayê hatiye dîtin.

şahidên pêşîn ên tekstên Încîlê ne û aîdê heyameke gellek berî Konseya Iznîkê (325) ne. Wergerên Încîlê yên bi zimanêñ din, bi taybetî jî bi zimanêñ Suryanî û Latînî jî hene. **Ev delîlên pirr, delaleta ku wergereke nûjen a Încîla ku hûn bixwînin û ya ku nifşêñ berê xwendine, wekhev in, dike.**

Weke ku me berê jî gotibû bi hezaran kopyayêñ *Încîlê* hene. Dema di navbera dîroka nivîsandina wan û ya nivîsandina pêşîn a *Încîlê* de pir kin e. Ji vê jî mirov dikare têbighê ku, texstên *Încîlê* ji yê hemî pirtûkêñ ku di wê demê de hatine nivîsîn hîn saxlemtir in û bêtir baweriya mirov bi wan tê.

Nusxeyeke balkêş a *Încîlê*, di sala 1933 yan de li ber çemê Feratê, di dema erdkolanêñ li Salihiyê de hatiye dîtin. Ev nusxeya ku di salêñ 235an ên P.Z. de hatiye nivîsîn, beşekî biçük ê *Încîla* rasteqîn e. Lê ev beş, ji berhemeke ku ji her çar besêñ Încîlê yên pêşîn ji nû ve hatiye sererastkirin, pêk tê.

Ev berhevoka *Încîlê*, berhema bawermendekî Mesîh yê bi navê Tatiyan ê Asûrî ye. Ev mirov xwendekarê Yustin Martirê feylesof ê bawermendê Mesîhî bû, ku P.Z. di sala 165-an de hatiye şehîdkirin. Piştî ku ew bi Yustin re demekê li Romayê dimîne P.Z. di sala 170 yî de vedigere welatê xwe Asûrê⁵. Li wir wî ev berhema bi navê Duatessaron, termê muzîkê ku tê mana “Harmoniya çar

⁵ Asûr: Başûrêrojhilata îroyîn.

awazan” pêk anî. Bi giranî di nav Asûrîaxêvan de belav bû, lê weke ku ji destnivîsa ku li Salihiyê hatiye dîtin tê fêmkirin Grekiya wê jî heye; paşê hatiye.wergerandin ser zimanê Erebî û çend zimanên din.

Duatessaron, ji ber ku ji Încîla ku em îro bikartînin pêk hatiye, ev jî îsbat dike ku eynî Încîl di nav bawermendên Mesîh ên sedsala duyemîn de xwediyyê rêz û desthilatiyeke bêhempa bûye.

3. Her Çar Beşen Încîlê û Sahidiya Wan a Li Ser Isa

Li gor ku berhema Tatiyan a ku ji her çar beşen Încîlê yên pêşîn pêk hatiye gellek rexbet dibîne, xwendevanê hêja belbî dikare vê bipirse: “Çima ji destpêkê de di derheqê jiyana Isa û mizgîniya ku wî anîbû de çar beş an kitêbok (Matta, Markos, Luka, Yûhenna) hatin nivîsîn? Ma kitêbokeke bitenê têrê nedikir?” Ger bitenê kitêbokek hebûya, wê lêkolîna Încîlê têra xwe hêsan bûbûya, zanîna me ya di derheqê wê de jî wê ji ya heyî hîn këmtir bûbûya. Em li ser kesekî din ê dîrokî bifikirin. Li ciyê ravekirinekê ger çar ravekirinên jiyana wî hebûna me yê xwe hîn bi sihûdtir nezanibûya? Divê em eynî mentiqê li jiyan û çavkaniyên me yêni li ser bîr û baweriya Isa jî tetbîq bikin.

Her sê kitêbokên ku di destpêka Încîlê de cîh girtine jî berî⁶ xelaseka sedsala yekemîn a P.Z. hatine nivîsîn.

Nivîsên sexte yên ku navê Încîlê li ser wan e û yên li ser jiyanâ ïsa hatine nivîsîn, di sedsalâ duyemîn an jî di salên piştî wê de derketine. Lê pisporê bêlayen û hemî mirovên zanyar, him di derheqê nirxê wan nivîsan ê dîrokî de, him jî di derheqê naveroka wan de, ji ber ku piştî bûyeran bi sedsalan hatine nivîsîn, gava ku mirov wan bide ber Încîla rasteqîn a ku em îro bikartînin, hemfikirin ku qîmeteke wan a zêde dîrokî tûneye⁷. Bi vî awayî mirov dikare bighê encama ku her çar besên Încîlê yên pêşîn (*Matta, Markos, Luka, Yûhenna*) ji pirtûkên din ên ku bûyer tomarkirine hîn nêzîktir in. Yek ji nivîskarê van her çar kitêbokan, *Lukayê Antakyayî*, di destpêka pirtûka xwe de li ser mebest û metoda xwe ji me re hin tiştan rave dike. *Luka*, xîtabî yekî pêşewa yê binavê *Teofilosê* ku pirtûka xwe jê re terxan kiriye, dike û weha dibêje:

“Gelek kesan dest avêtiye ku dîroka tiştên di navbera me de dibin binivîsin. Baş e ku ji destpêkê de şahidên van bûyeran û xizmetkarê peyva xwedê ev bûyer ragîhandine me. Min ji munasib dît van bûyerên ku ji destpêkê de bi

⁶ Li gor gelek zanyaran kêm zêde tarîxa nivîsandina vê pirtûkê bi rêzê wiha ye: *Matta-P.Z.60, Markos-P.Z.58, Luka-P.Z.61, Yûhanna-P.Z.90*

⁷ Ev berhemên ku hîn jî mevcûd in, tevî ku di derheqê ïsa de hin efsaneyên bêqîmet nivîsîne jî, bi felsefeya Încîlê ya bingehîn re nakevin nakokiyê.

*ihtîmam min li wan kolaye ji te re birêzê binivîsim.
Da ku, tu jî zanibî agahdariyên ku ji te re hatine
dayin rast in.” (Încîl: Luka 1: 1-4)*

Li vir Luka, diyar dike ku lêkolîna wî ne li ser esasê hêza xeyalên wî, berevajiya wê li ser esasê lêkolîneke dîrokî û şehadeta şahidên dîtî ye. Luka, ne tenê beşê ku bi navê wî hatiye nivîsin, beşê *Karên Şandiyan (Resulan)* ê ku berdewama vî beşî ye jî nivîsiye. Delîlên ji belgeyên dîrokî û arkeolojiyê ewlekariya van her du pirtûkan bi hemî detayan tasdîq kirine. Yek ji belgeyên ku *Luka* jê îstîfade kiriye beşê *Încîlê* yê *Markos* bûye; mirov têdîghê ku çavkaniyeke din jî berhevokeke peyvîn Îsa ye. Diyar e beşê *Încîlê* yê *Matta* jî ji van her du çavkaniyan îstîfade kiriye. Bi vî awayî derdikeve holê ku peyvendiyeye nêzîk a kitêbokên *Matta*, *Markos* û *Luka* bi hev re heye û pir dişibin hev. Lê dîsa jî, her yek ji wan çîroka jiyana Îsa li gor nêrînên cihê pêşkêş dikan. Lê di navbera wan de tu nakokî tunene. Beşê *Yûhenna* yê *Încîlê* xwedî taybetiyeye cihê ye. Ber bi dawiya sedsala yekemîn, bitaybetî jî li gor ku xwendevanên ciwan ê wê demê jê îstîfade bikin, hatiye nivîsin. Ev ciwan, him ji aliyê zeman, him jî ji aliyê mekan ve dûrî qada ku îsa lê jiyabû û ew dabû fîrkirin bûn. Mebesta *Yûhenna* ew bû ku bi xwendevanên xwe bide zanîn bê Îsa kî bû. Îsa, bişiklê rastiya ebedî ku bûbû beden, kaniya jiyana bêdawî û riya rast a bitenê ya ku diçe ba Xwedê teswîr dike. Li gor vê jiyana îsa û tiştên dide fîrkirin, di her demê de, ji bo hemî mirovayetiyê xwedî girîngiyeke taybetî û berdewam e.

Weke Luka, Yûhenna jî îddîa dike ku tiştên nivîsîye li gor şehadetiya kesên dîtî nivîsîye. Ev yek, weke di beşê Yûhenna de tê ravekirin, tiştên ku piştî gava Îsa li çarmîxê dimre, dibêje, “Temam bû!” (*Încil: Yûhenna 19: 30*) dîbin, pir eşkere tên dîtin. Gava tê xwestin ku mirina tawanbarêñ li çarmîxê xistî zûtir bibe, lingêñ wan tê şikandin. Tawanbarêñ ku bêyî desteka lingêñ wan ên bi darê çarmîxê vebihata bizmarkirin, nikaribûn bîhna xwe bida û bistenda zû difetisîn û dimirin. Roja ku Îsa û her du tawanbarêñ li tenışta wî li çarmîxê xistin, dihate xwestin ku zû bimrin. Ji ber ku dotira rojê him roja Şemiyê ya heftiyê bû, him jî Cejna Fisiha⁸ salê ya ku ji alî cihûyan ve weke cejneke pir pîroz bû, rojeke duqat pîroz bû û bi dar de hiştina miriyan bi awayekî eşkere, wê pîroziya wê rojê xera bikira. Yûhenna bûyeran bi vî awayî ravedike:

“Li ser wê yekê esker çûn lingêñ mirovê yekemîn, paşê jî yê duyemîn ku bi Îsa re li çarmîxê hatîbû xistin şikandin. Lê gava ku dor hate ser Îsa nêrîn ku ew miriye. Ji ber wê jî lingêñ wî neşikandin.

⁸ Cejna Fisih: Gelê Îsraîlê , di salêñ 1280yan de (B.Z), di bin pêşkêşıya Hz. Mûsa de ji bin destê Misriyan rizgar bû. Cejna Fisihê, bi armanca bibiranina vê rizgariyê tê pîrozkin. Îsraîlî berî ji Misrê derkevin Xwedê, melekê xwe yê mirinê rêkir û zarokêñ Misriyan ên lawîn ku nû çêbûbûn hemî kuştin. Melek di ser malêñ Israîlîyan re jî qevizî, derbas bû. Ji ber wê jî ji vê Cejnê re bi mana di ser re derbasbûnê Fisih tê gotin. Îro jî ev weke cejna Nanê Şikeva tê zanîn.

Dîsa jî, yekî ji eskeran bi rimê newqa wî kun kir. Ji newqa wî, wê gavê xwîn û av herikî.”

Li vir *Yûhenna* ji bo vê îfada ciddî bide, navberiyê dide ravekirina xwe:

“Mirovê ku ev yek diye şahidî kiriye û şahadeta wî rast e. Ji bo ku hûn jî baweriya xwe pê bînin şahidî kiriye.” (Încil: *Yûhenna* 19:32-25)

Heta nifşê şahidên dîtî kêm bû û hêdî hêdî ji navê ranebû, kesî dest bi nivîsandina Încîlê nekir. Heta ku kesên Îsa nas dikirin û karibûn tiştên dîbûn ûbihîstibûn ravekin saxbûn, ne hewce bû ku mirov pirtûkekê binivîse. Lê gava ku ev şahidên dîtî, destpêkirin yeko yeko mirin, pêdiviya tomarkirinê nivîskî bû tiştekî acîl. Îcar ev tomarkirinê nivîskî, nikaribû ji şahadetiya şahidên dîtî averê bibûya. Ji ber ku şahidên dîtî yên Îsa nas dikirin hîn sax bûn û kesên tiştên ku wan rave kiribûn bihîzibûn, pir bûn. Ji ber wê jî nivîskarêñ Încîlê ger zanyariyeke li dijî rastiyêñ dihatin zanîn binivîsana, bawermendêñ Mesîhî ên ku wê demê dijiyan wê ev pê re fêm bikirana.

Hîn berî pirtûkêñ ku Încîlê pêkanîne bêñ nivîsîn, kesên ku Îsa bixwe naskirine yan jî şahidên dîtî bi serinc guhdarî kirine û zanyariyêñ bihîstine yekî ji yê din re gotiye û belav kirine, hebûn. Weke pisporêr zîmêñ zanîn, ravekirina devkî li gor hin qaîdeyan dibe. Ev qaîde, dest didin ku zanyariyêñ têñ ravekirin rast bêñ ragîhandin nifşêñ bê. Ji vê jî derdikeve holê ku ravekirina devkî bikêmanî weke tomarkirinêñ

nivîskî, hete carinan ji wan jî ewletir in. Pispor, dikare têbighê ku li paş Încîla nivîskî taybetmendiyên ravekirina devkî hene. Ev taybetmendiyên ku ji aliyê din ve di nameyên Pavlos ên ku bahsa rastiyên bi Îsa ve girêdayî dike û berî nutqên di beşê Încîlê yê karêن Şandîyan û berî besên Încîlê yê Matta, Markos, Luka û Yûhenna jî hatine nivîsîn de têن dîtin.

Di Încîlê de, beşê pêşîn ê *Markos* bû ku jiyanâ Isa û mizgîniya wî tê de hatiye nivîsîn. Kêm zêde P.Z. di sala 58an de *Markos*, bi vî awayî destpêdike û nasnameya rasteqîn a kesê ku bahsa wî dike, îfade dike:

“Destpêka mizgîniya bi Kurê Xwedê Isa ve eleqedar.”

Îfadeya “Kurê Xwedê” ku di Încîlê de mirov gelek caran rastî vê tê, ji ber ku şaş hatiye fêmkirin ji bo hinekan bûye sedemê hin astengiyan. Di vê îfadeye de peyva “Kur” bi awayekî normal ne di mana xwe ya bîyolojîk de hatiye bikaranîn. Gava li Isa bê tetbîqkirin, peyva “Kur” bi tenê bi têkiliya wî ya hergav û bêhempa ya bi Bav Xwedê re namîne, her weha delaleta nîşandana Bav Xwedê bi awayekî tekûz bi însanan re jî dike. Di eslê xwe de, di navbera mana îfadeya “Kurê Xwedê” û Peyva Xwedê ya ku Yûhenna weke nav li Isa kiriye de tu ferqek tuneye.

Him “Kur” him jî “Peyv” (kelam), tiştê ji eslê Xwedê tê û wesfê Wî ye îfade dike. Herçend Xwedê di wextinêن

din de xwe bi riyêن din, wek nimûne bi wasîteya pêxemberên xwe Xwe Nîşan dabe jî, lê cara dawîn û bi awayekî tekûz xwe di şexsiyeta Mesîh Îsa de nîşan da.

“Di demêن berê de Xwedê perçe bi perçe, bi riyêن cihê, bi (destê) pêxemberan bi bav û kalan re peyivî. Îcar di van rojêن dawî de, ew bi Kurê xwe yê ku ew kiriye mîrasdarê her tiştî û bi destê wî gerdûn çêkirine bi me re peyivî. Ew, biriqîna berziya Xwedê û dîtîna hebûna wî ya esasî ye. Ew her tiştî bi hêzdariya peyva xwe hildigire. Piştî ku wî guneh dan safikirin, li jorê, li milê rastê yê, yê mezin rûnişt.” (Nama İbraniyan 1:1-3)


Peyva “Kur,” her weha jî tê wê maneyê ku, Xwedê ne bitenê xizmeta xwe ya anîna însên a ser dinyayê, her weha jî (hette herî bêtir) bi mirina wî û ji nû ve vejîna wî Xwe Nîşan da. Yûhenna di vî warî de weha dibêje: “Yê ku bi av û xwînê hat Mesîh Îsa ye.” (Ango, Mesîhê ku dema di avê de hate imadkirin Kurê Xwedê hate îlankirin, gava ku xwîna xwe rijand û mir jî dîsa nîşan da ku Kurê Xwedê ye.) Ü Yûhenna ji bo li ser rawestinê, tiştên ku gotiye bieynî peyvan dubare dike: “(Îsa) bitenê ne bi avê, bi av û xwînê hat.” (İncil: 1. Yûhenna 5: 6). Markos jî gava ku Îsa li ser çarmîxê can dide rave dike û dibêje: “Di wê navê de perdeya li perestgehê ji jor ber bi jêr de çiriya, bû du ciyan.” (İncil: Markos 15: 18). Tiştê ku dixwaze bêje ev e: Huzura Xwedê ya ku bi çavan nedihate dîtin berê li piş perdeya perestgehê veşartî bû, lê Îsa ji bo gunehên însanan

ji navê rake Xwe ji dil û can kir gorî û “perdeya” di navbera însan û Xwedê de bû rakir, tune kir. Xwedê bi vî awayî îsbat kir ku Ew “Rahman û Rehîm (*dilovan û dilovin*)” e. Divê mirov şas nemîne ku, li gor Markos ravedike, sersedê Romayî yê ku Îsa li çarmîxê xist û bûyerên seyr dîtin, got: “Ev mirov birastî jî Kurê Xwedê bû!” (*Încil: Markos 15:39*).

Tiştên ku li jor hatine ravekirin kurtebirriya baweriya wan kesan e ku ji destpêkê de baweriya xwe bi Mesîh Îsa anîbûn. Ji xeynî Încîlê em dikarin mînakeke din pêşkêş bikin: Pêşengê civata bawermendêن Antakyayî Îgnatyus, di nameya xwe ya ku di sala 110 an de (P.Z.) ji bawermendêن Efesî re şandibû de Îsa weha dide naskirin:

“Rebbê me Mesîh Îsa hakimê bitenê ye. Him bedena wî him jî ruhê wî heye. Tevî ku ji jinekê bûye jî destpêka wî tuneye. Îsa Xwedayê ku xwe xistiye şiklê mirov e; di mirinê de jiyan rasteqîn e; Kurê Meryem û yê Xwedê ye; pêşî tengayî dîtiye, paşê ji tengayiyê rizgar bûye.” (*Nameya Ignatyus a ji bo Efesîyan 7:26*)

Piraniya zanyariyêن me yên di derheqê jiyan Îsa û tiştên ku fêrî me kiriye de ji berhemên nivîskarêن ku baweriya xwe pê anîne tê. Divê em ji ber vê yekê şas nebin; bêtir pê elaqedarbûna kesên ku baweriya xwe bi avakerê civata xwe Îsa anîne, ji yên din tiştekî xwezayî



Cotek rüpelé ji nusxeyê destnivîs ên Încîlé yê herî Kevin û girîng, Kodeks Sinaiticus e ku P.Z. di sedsala 4. de hatiye nivîsin di pirtûkxaneya manastîra quntara Çiyayê Sîna de hatiye dîtin. (Încîl: Luka 19:30-20: 34). London-British Museum.



Perçeyekî Rylands ê papîrûsê yê aidê salên 130-140 ên P.Z. ku weke nusxeya herî Kevin a Încîlé tê zanîn. Pirtûkxaneya John Rylands a Zanîngeha Manchesterê.

transcom curacy
involves. The critical
activities are those
that involve certain
processes that allow
us to do a certain
number of things.
These include things
such as self-service
or people coming in
and getting what they
need from us
so we can do
what they want
and what they
need. These
activities are very
important because
they help us to
achieve our goals.

Yek ji nusheyên Încilê (ayetên Yûhenna 6: 53) ya destnivîs ku aîdê sedsala 5. a P.Z. bi zimanê Suryanî yê nêzîkî zimanê Aramî yê ku Îsa Mesîh pê diaxivî hatiye nivîsîn. London-Britich Museum.

ΕΠΙΣΤΑΜΕΝΟΙ ΚΑΙ ΕΠΙΣΤΗΜΕΝΟΙ ΤΟΥ ΣΩΤΗΡΟΥ ΕΠΙΣΤΗΜΕΝΟΙ ΤΟΥ ΣΩΤΗΡΟΥ

ΕΠΙΦΥΤΟ
ΡΟΝΟΜΙΟΝ
ΕΠΗΝΗΤΩΓΡΑΥΛΟ
ΕΚΑΙΦ
ΑΝΑΓΙΝΩΣΚΟΝΤΙ

ΧΩΝΔΙΕΙΣ ΕΡΗΜΙΝΕ
ΚΑΤΑΛΙΒΙΣ ΧΑΡΟ
ΗΝΝΕΥ ΣΥΛΛΗΝΕΙΟ
ΝΟΥΟΡΙΝΕ ΗΛΑΩΡ
ΗΛΑΚΟΥ ΥΦΕΡΙΝΟΙ
ΕΠΙΟΥ ΔΙΠΕΤ ΦΡΟΝ
Η ΜΗΟΙ ΚΕΩΝΙΤ ΠΕΟΣ
ΝΤΕΡΓΑΙΩΝ ΒΙΗΝΗΤ
ΕΠΙΟΥ ΥΕΝ ΝΑΙΩΝ
ΑΥΧΙΤΙΤ ΤΕΧΝΗΝ
ΕΥΗΝΟΤΗΤ ΥΕΧΙΚ
ΠΕΤΕΛΛΑΙ ΜΑΥΛΗΝ
ΚΕΥΙ ΥΑΛΙ ΥΕΓΗΝ
ΗΑΛΑΥΝΟΙΝ ΚΑΙ
ΠΕΤΑΛΛΑΙ ΜΑΥΛΗΝ
ΗΥΛΗΡΥΩΝ ΕΧ.
ΒΗΥΕΤΗ ΥΑΙΩΝΙ
ΒΩΚΕΖΟΥΝ ΕΝΕΥΑ
ΕΙΟΝΟΥ ΕΙΝΕΝΗ
ΕΙΝΕΝΟΥ ΕΙΝΕΝΗ
ΟΠΙΝΕΤ ΒΩΦΙΝΗ
ΜΣΥΟΦ ΙΟΥΕΙΝΗ
ΤΑΙ ΓΟΥΕΙΝΗ
ΖΗ ΝΟΙ ΚΟΝΟΙ ΔΗ
ΗΗ ΝΗΡΗ ΖΗΝΗ
ΝΕΟΙ ΑΥΔΑΛΗΤ
ΛΟΣ ΤΗΙ ΖΗΝΗΝΗ
ΦΛΗΝ ΥΑΧΙΤ
ΗΗ ΝΗΡΗ ΑΓΧΩΝΗ
ΗΗ ΝΗΝΟΥ ΥΟΤΕΡ
ΗΕΥΧΕΙΙ ΛΙΝΗΝ

Pirtûkeke destnivîs bi zimanê Kiptî
yê Misra Kevin e. Di destpêka sedsala
4. a P.Z. de hatiye nivîsîn. London-
Britich Museum.

*Rupelek ji pirtúka destnivís a bi zimané
Kiptí ku PZ. di salén 400í de hatiye nivisín
û baweriya Gnostik Valentinus té de cih
girtye. London-British Museum.*

ye. Lê agahdariyênu ku ji nivîskarênu pêşî bawerîya xwe bi Mesîh neanîne tênu, detayênu sereke yên rastiyênu ku di Încilê de hatine ravekirin tesdiq dikan. Weke nimûne, dîroknivîse Romayî Takîtus rave dike ku, di sala 64an a P.Z. de, pişti agirê hemî Roma şewitandiye, Împeretor Neron han daye ku sûcê xwe têxe stuyê bawermendênu Mesîhî. Takitus, cara ewil di vê dera berhemâ xwe de bahsa navê bawermendênu Mesîhî dike û weha dibêje: Peyva bawermendênu Mesîhî (yên ku bawerîya xwe bi Mesîh İsa tînin), gava ku Tiberius Împeretor bû ji Mesîh İsa yê ku bi emîre wali Pontius Pilatus hatibû idamkirin hatiye girtin (*Anal 15: 44*). Takitus ev tişt pişti şewatê bi pêncî salî nivîsibûn, lê gava ku Roma şewitibû, ew zarokekî duwazde salî bû; ji ber vê tiştên ku wê wextê bihîstiye karibûye bibîrbîne.

Dîroknivîse Cihû Yosefusê ku ne bawermendekî Mesîh e (P.Z. 37-?105) weha nivîsiye:

“Van wextan zanayekî bi navê İsa hebû, ger mirov ji Wî re bêje peya (zilam) rast be... Ji ber ku Ew kesekî ku karênu mirov lê şas dibû, dikirin, mamosteyê kesen ku rastî bi dilşadî qebûldikirin bû. Gelek Cihû (Yahûdî) û Pagan (Yên ku ne Cihû ne) bi alî xwe de kişandin. Dihate bawerkirin ku ev Mesîh (rizgarkerê ku dihate payin) e. Gava ku Pilatus jî, li ser pêşniyariya rûsipiyênu di nav me de, Ew bi cezayê li çarmîxê xistinê mahkûm kir, yên ku berê jî ji jê hezdikirin

terka wî nekirin. Ji ber ku Wî, piştî ku ew li çarmîxê xistinê bi sê rojan dîsa sax Xwe nîşanî wan dabû; her weha pêxemberên Xwedê yên din jî bi deh hezaran tiştên wî yên ku mirov lê şas û mat dimîne berê ragîhandibûn. Neslê bawermendên Mesîh (Xiristiyan) ên ku navê xwe ji Mesîh Îsa girtine iro jî xelas nebûye⁹.”

Waliyê Romayî yê wîlayeta Bitinya ya ku iro li Bakurê Rojava yê Enedolê dikeve Pliniyus (P.Z.69-113), di mektûbeke xwe ya ku ji Împeretor Trayanus re dişîne de weha dibêje:

“Li gor ku dibêjin (Bawermendên Mesîhî ên ku ji ber peykerê Împeretor nediperestin min ew ceza kirin), sûc û qebeheta wan bi taybetî incax ewinde bû: Di rojeke mueyen ku li ser biryar dabûn de, berî roj hilê wek ji Xwedê re bêjin li ser şerefa Xirîstos (Mesîh Îsa) bi awayekî muntezam ji bo îlahiyan bêjin dicivîyan¹⁰.”

Dîroknivîsê Romayî Tallusê P.Z. di sala 52yan de jiyaye, dîroka giştî ya welatê Deryasipî ya Rojhilat nivîsîye. Mixabin tiştên ku nivîsîbûn ji ber wexta di navberê de buhûrî yan ji ber ku wenda bûn, yan jî ji ber ku hatin tunekirin, navroka wan êdî em birastî jî nema zanin. Lê, nivîsîn Tallus ên P.Z. di sedsla III. de hîn jî tiştek bi wan

⁹ Josefus, Tarîxên Kevin ên Cihûyan, XVIII 3: 63-64.

¹⁰ Pliniyus, Nameyên wî 10: 96.

nehatiye, merivekî bi navê Afîkanus li nivîsên Tallus kolaye û di berhemên xwe de dibêje ku Tallus bahsa afetên xwezayî¹¹ yên wexta mirina Îsa kiriye. Bi gotineke din iħtîmaleke mezin heye ku Tallusê dîroknivîsê berbiçav ê Romayê yê derdora salên 50 yên P.Z ye, jiyan û mirina Îsa bi alema putperest ragîhandibe.

Li gor irf û adetên xaxamên Cihûyan ku di pirtûka bi navê *Talmud* de têr rawekirin, Îsayê Nasirayî
“*Gunehkarekî li Îsraîlê bû, peyvîn zanayan kêm didîtin, xelk ji rê derxistin û sêhrbazî kir.*”

(Gotina sêhrbaziyê ji ber ku riyeke din a îzaha mucîzeyên Îsa nedîtibûn, tê.) Li gor *Talmudê* “Îsa gotiye ku ew ne ji bo ku tiştekî ji qanûna Musa rake, ne jî ji bo tiştekî lê zêde bike hatiye. Di erefeya Cejna Fisihê de hate bidardakirin.” Ev ravekirineke dijminan e , lê her çend li ser esasê şiroveya kesên li dijî Îsa rawestabin be jî, nikaribûye rastiya bûyerên dîrokî yên bi serê Mesîh Îsa de hatine încar bike¹².

¹¹ Încîl: Matta 27: 45.

¹² Em ji kesên ku dixwazin ji xeynî Încîl û alema Xiristiyan li nimûneyên wek vê binêrin re pirtûka binavê “Jesus and Christian Origins Outside the New Testament” (F.F. Bruce, 1974) tavsiye dikin.

4

Zimanê Încîlê

Zimanê ku Îsa bi pirranî bikartanî ihti'maleke mezin zimanê Aramî bû. Ev ziman, wê demê zimanê zikmakî yê Cihûyên li Felestînê dijiyan û yê kesên ku li gelek herêmên di navbera Suriyê û Mezopotamyayê de rûdiniştin bû. Zimanê Aramî, ji malbata zimanên Samî, xizmê Erebî û Îbranî ye. Hin ji peyv û biwêjên Aramî yên Îsa di Încîlê de weke orjînalên xwe hatine parazsin. Weke mînak, di *Încîl Markos* 5:41ê de gava ku Îsa, keça Yair ji nav nivîna mirinê radike, dibêje “*Talîta gumî*” (Keçikê rabe). Dîsa di *Încîla Markos* 7:34an de, gava mirovê kerr û lal biguh û ziman dike dibêje “*Effata!*” (Vebe). Peyva Abba (Bavo) ku bi taybetî ji alî Îsa ve ji bo Xwedê dihate bikaranîn, paşê derbasî zimanê bawermendên ku bi Grekî diaxivîn jî bû. (*Li Încîla Markos* 14:36, *Nama Romayıyan* 8: 5, *Nama Galatiyan* 4: 6an binérin.) Gava Îsa li çarmîxê êş û elem dikşand ev peyvên ji wergera zimanê Aramî ya ayeta yekê ya *Mezmûra* (*Zebûra*) 22-yan dubare kir. “*Elohi, elohî, lama şekwaktani?*” (Xwedayê min, Xwedayê min, te çima ez bitenê hiştim?) (*Încîl: Markos* 15:34): Piraniya xwendekarêن pêşîn ên Îsa Mesîh jî bi zimanê Aramî diaxivîn, hin ji biwêjên wan ên bi Aramî jî hatine parastin. Bi taybetî jî biwêja Maranata (Xwedayê me, were!). Ev duaya ha, dema xwarina ku bi hev re dixwin, ji bo careke din hatina Îsa dikan. (*Nama Korîntîyan* 16:22)

Îcar her çar besên pêşîn ên Încîlê (*Matta, Markos, Luka, Yûhenna*) besên din ên Încîlê jî tê de, ne bi zimanê Aramî ne, bi Grekî hatine nivîsîn. Peyvêن Isa û şagirtêñ wî yên bi Aramî, berî ku bi vî awayê niha bighêñ me hatine wergerandin ser zimanê Grekî. Ev, çima weha bû?

Sedemê pêşîn, ji fethêñ Îskenderê Mezin bi vir de (B.Z. 336-323) Felestîn bûbû perçeyek ji dinya Helenîstîk¹³. Felestîniyêñ ku zimanê wan ê zikmâkî Aramî bûn bixwe, piştî wê demê piraniya çanda Helenîstîk pejirandibûn. Her çend ji ber dîn an jî welatparêziyê gellek kesî xwest bi Grekî biaxive jî, ew ziman jî dikaribûn fêm bikirana. Piraniya Cihûyêñ Felestînî herhal dê Îbranî jî têbigihîştana; lê ji ber ku weke zimanekî pîroz dihate hesêb, ji mal û çarşiyê bêtir li sînagogê bikar tanîn. Gava carinan Încîl ji “Îbranî” xeber dide qesta wê zimanê Aramî ye. Weke mînak, lewheya sûc a li çarmîxê li ser serê Isa, ku li ser “Padîşahê Cihûyan” hatibû nivîsîn tê gotin ku bi Îbranî, Latînî û Grekî hatîye nivîsîn. (*Încîl: Yûhenna 19:19-20*) Li vir Îbranîya ku bahsa wê tê kirin, îhtîmaleke mezin Aramî ye. Lewheya sûc çima ji xeynî Îbranî (yan Aramî) û Grekî pê ve bi Latînî dê bê nivîsîn? Latînî zimanê fermî yê artêşa Romayê bû, ji ber wê. Ji ber ku Pilatus serdarê artêşa Roma ya li welatê Cihûyan bû, kesen ku karê li çarmîxê xistina tawanbaran bicih dianîn eskerên wî bûn.

¹³ Helenistik: Li cîhana Grekî (Yunanîstana Kevin) heyama piştî heyama Îskenderê Mezin e.

Sedemê duwem, *Încil*, di nav kesên ku ji Grekî pê ve bi zimanekî din nizanibûn de, wê gavê belav bû. Ev belavbûn, pêşî li Felestînê (bi pirranî li Sezariyeya ku Grekî lê dihate axavtin), paşê li Suriyeyê û li Enedolê (bi taybetî jî li bajarê mezin Antalya ya ku dîsa Grekî lê dihate axavtin) û li welatên din ê Derya Sipî ya Rojhilat dibû. Li van welatan zimanê ku herî bêtir dihate axavtin û têgîhaştin Grekî bû. Dema ku mirov ji Qudsê û navendên din ên ku Aramî lê dihate axavtinê, Felestînê bidûr diket nediket, zimanê ku şandiyên Îsa û “mizgîn” belavkerên din pê diaxivîn, Grekî bû. Wê demê Pavlosê li bajarê Tersûsê yê ku Grekî lê dihate axavtin çêbûbû, berî ku zimanê li bajêr belavbûyî fêr bibe li nav malbata xwe ya muteasib zimanê Aramî fêr bû. Lê bibe nebê weke şandiyekî ku Xwedê ji paganen (pirrxwedayan) re şandibû, ji bo nameyan binivîse diviya zimanê Grekî bikar baniya. Li gor ku *Încil* ne tenê ji bo Cihûyan, ji bo herkesî bû, nivîsên bingehîn ê baweriya Mesîh, bi zimanê herî bêtir li herêmên ku mizgîniya Îsa lê hatibû belavkirin belav bûbû, ango, bi Grekî hate nivîsîn û belav bû. Ji destpêka sedsala duyem a P.Z. hin nivîsên *Încîlê*, bi zimanê Suryanî yê ku cûreyekî zimanê Aramî ye belav bû, lê ev *Încîla* bi Suryanî, ji Grekî hatibû wergerandin. Dîsa jî, pisporêñ ziman bi lêkolîneke biserinc a peyvîn Îsa yên bi Grekî, bihêsanî dikarin Aramiya wan texmîn bikin.

Di dema Împeretoriya Osmanî de fermanêñ sultan tevî ku bi gellek zimanan dihatin belavkirin, Yunanî, Slavî, Erebî û hwd. weke Tırkiya wan a orjînal derbas dibûn. Kesekî

nikaribû bigota ku, “hete ez Tirkiya wê ya orjînal nebînim ez Fermana Sultên qebûl nakim!” Her weha kesî nikaribû bigota ku, peyvên Îsa wergerin ser zimanekî din nayêñ hisêb.

5. • Lîsteya Pirtûkênu Ku Încîl Pêkanîne Kengî Hate Hilbijartin?

Bi fermana împeretor Konstantîn, P.Z. di sala 325an de û Konseya Iznîkê ku ji 300 rêberên bawermendêñ Mesîhî pêk hatibû, bi teswîrkirina têkiliya Îsa Mesîh a bi Bav Xwedê re heta ku mumkun bû, bi qutbirî mijûl bû. Bi bidanasîna ku wê kîjan pirtûka dînî derbas be an nebe mijûl nebû. Li ser lîsteya fermî ya nivîsêñ pîroz ên ji aliyê kesêñ ku baweriya xwe bi Îsa anîbûn ve hatibû tesbîtkirin, ji zû de biryar hatibû dayîn. Heta ev nivîs, bûn belgeyêñ bingehîn ên ji bo bicihanîna armanca kombûna beşdarêñ Konseya Iznîkê ku xwe bispêrin¹⁴.

Ev lîsteya nivîsêñ pîroz, ji aliyê civata kesêñ ku baweriya xwe bi Îsa tanîn ve weke pirtûkênu ku ji belgeyêñ esasî pêkhatine têñ hisêb û desteka jiyan û baweriya vê civatêne. Civata kesêñ xwedî bawerî jixwe weke xwedîyê

¹⁴ Ji bo kesêñ ku bixwazin di vî warî de zanyariyêñ zanistî û bikitekit bistînin em dikarin pirtûka bi navê “Di konseya Iznîkê de ci bû?” tavsiye bikin.

berhevokeke pirtûkêن pîroz ên ku ji alî herkesî ve têن qebûlkirin derketin holê. Îsa, weke me ji berî de gotibû nivîsên *Peymana Kevin* (*Tewrat, Zebûr, Pirtûkêن Pêxemberan*), weke pirtûkêن ku Jê re şahadetî kiribûn qebûl kirin. Şagirtêن Îsa têgihîstîn ku Wî pêşbelavokêن di pirtûkêن *Peymana Kevin* de cîh girtine, pêkanîne. Bi vî awayî civata kesêن xwedî bawerî *Peymana Kevin* weke pirtûka ku Xwedê ew îlham kiriye ji xwe re weke mîrat girtin. Lê çi peyvên Îsa yên ku dema ew li dinyê bûye gotiye, çi jî fikrê ku bi riya fikr û ramanêن ku bi wasîteya Ruhê Pîroz ji şagirtêن xwe re îlham kiriye, ji peyvên pêxemberêن *Peymana Kevin* kêmtir nedihatîn hesêb. Tevî vêjî:

- (1) Heta ku ev fikir neyên nivîsandin
 - (2) Heta ku ji bo pêkanîna berhevokeke nivîskî ku fikrêن heyî bigre nav xwe kom nebin
 - (3) Heta ku ev berhevok nebe weke pîvana bawerî
 û pratîka wê, neyê qebûlkirin;
- mirov nikare ji lîsteyeke fermî ya nivîsên ku *Încîl* pêkanîne bahs bike.

Wek me berî jî got hemî besên cihê cihê yên *Încîlê* P.Z. berî xelaseka sedsala yekem hatine nivîsîn. Pêvajoya berhevkirina hin ji van beşan, ber bi dawiya sedsala yekem dest pêkir û di sedsala duyem de jî dom kir. Di despêka sedsala duyem de du berhevkirinêن girîng pêk hatine: Yek jê ya li ser jiyana Mesîh Îsa, berhevoka her çar besên ewil ên *Încîlê* (*Matta, Markos, Luka, Yûhenna*) ye, ya din jî berhevoka nameyên Pawlos e. Nivîseke din a ku

girêdana di navbera van herdu berhevokan de pêk anî û ew ji bo bibin wek berhevokeke bitenê bi hev ve girêda jî hebû - pirtûka *Karên Şandiyan (Resûlan)*. Ev nivîs, ne tenê ji dewama bûyerên ku di pirtûkên *Matta, Markos, Luka* û *Yûhenna* de bahsa wan hatibû kirin pêk tê, her weha jî îmkana ku em nameyên Pawlos bi têgihîstineke mezin bixwînin jî dide me; wekî din jî delîlekî din ê wezîfeya xizmeta şandîtiya Pawlos a ji bo Îsa û delîlekî din ê wezîfeya hin şandiyên din e.

Ev berhevoka mezin, bi hin nivîsên çend pêşengên bawermendên Mesîh ên sedsala yekem re, weke *Pirtûkeke Pîroz* a ku desthilatiya wê bêhempa ye hate qebûlkirin. Ev pirtûka pîroz a ku jê re *Peymana Nû* an Încîl tê gotin him ji alî kesên ku ji riya Xiristiyanî rasteqîn derketibûn, him jî ji aliyê bawermendên Mesîh ên ku li ser riya rast bûn ve hatibû qebûlkirin. Di sala 1945an de li Nag Hammadiya li Misra jorîn pirtûkxaneyeke kevin a Kiptîyan hate dîtin. Di vê pirtûkxanê de, hin wergerên bi Kiptî yên çend pirtûkên kesên baweriya xwe bi Mesîh tanîn, ku eslê wan Grekî bûn û P.Z. di heyama navîn a sedsala duyemîn de hatibûn nivîsîn, hatin dîtin. Hin ji van pirtûkan ji aliyê hin endamên terîqeta bi navê Valentinusîyan a ku ji aliyê mirovekî bi navê Valentinus ve hatibû danîn ve hatine nivîsîn. Her çend serokên civatêن xwedî baweriya rasteqîn ev pirtûk ji aliyê fikrî ve saxlem qebûl nekiribin jî, dizanibûn ku Valentinusî jî eyanîÎncîlê bikartînin û wê weke pirtûkeke ku ji aliyê xwedê ve hatiye îlhamkirin dihesibînin.

Piştî nivîsandina Încîlê bi gellekî, P.Z. di sedsala duyem

de hin kesên ku ji ser riya baweriya hin fikrên *Încîlê* derketibûn, peyda bûn. Ji van hinekan dixwest hin besên *Încîlê* yên ku ne dipesinandin derxin, hinekan jî dixwest jixwe ve peyxamên nû lê zêde bikin. Lê kesên ku li ser riya rast a Mesîh Îsa bûn, ji zû ve 27 besên ku *Încîl* pêktanîn qebûl kiribûn û baş dizanibûn ku çi di nava vê pirtûka pîroz de ye. Ji ber wê jî teşebbûsa kesên ne li ser riya heq biser neket. Ji bo biryargirtina ku wê kîjan pirtûkên dînî bêñ pesinandin pêdiviya kombûna konseyekê tunebû. *Încîlê* bi saya qîmet û marîfetên xwe, xwe bi hemî kêsên xwedî bawerî da qebûlkirin. Wek ji Qanûna Muratori¹⁵ jî mirov tê dighê, lîsteyeke besên ku *Încîlê* pêktînin ji aliyê bawermendan ve herî dereng P.Z. di sala 170yî de hatibû amadekirin. Ji vê jî mirov têdighê ku *Încîl*, berî civîna Konseya Iznîkê ya ku P.Z. di sala 325an kombûbû bi gellekî, bi *Peymana Kevin* re ji aliyê bawermendan ve weke pirtûka yekta ku derbasdibe, hatibû pejirandin.

Divê dîsa em bi awayekî girîng diyar bikin ku, besên *Încîlê* pêktînin ne ji aliyê konsey an komeke metranan (papazan) ve hatiye hilbijartin û qetiyen bi zorê Nehatiye qebûlkirin. Riya Mesîh Îsa di sedsala çaremîn de heta ku bû dînê resmî yê ku jê re ‘Xiristiyantî’ dihate gotin, dêra dewletê û nîzama metraniyê tunebû.

¹⁵ Qanûna Muratori ya ku aîdê sala 170yî ya P.Z. bû, lîsteyeke pirtûkên pîroz ên wê demê ku jî ji aliyê kesên baweriya xwe bi Îsa tanîn ve hatibû qebûl kirin e. Di vê lîstê de ji xeynî pênc beşan, navê 27 besên ku *Încîl* pêkanîne derbas dibe. Di Qanûna Muratori ya ku cîh cîh rizîya bû de belbî di wexta xwe de navê hemî besên ku *Încîl* pêk tanîn hebû.

Berevajiya wê, kesên li ser şopa Mesîh, kêmayetiyeke ku biçûk dihate dîtin û bi zorê zilm li wan dihate kirin bûn. Ger bixwestana jî, tu pirtûkeke pîroz nikaribûn bazorê bidana qebûlkirin. Hin Împeretorê Romayî yên pûtperest kesên ku *Încîl* dixwedin cezayê idamê didan wan. Ger şikka bawermendan ji ewleyiya *Încîlê* hebûna, ew pirtûk nedixwedin û ruhê xwe nedixistin xeterê.

Piştî 27 beşên *Încala* ku em wê rast dizanin hate nivîsîn bi sedsalan, hin berhemên sexte yên ku bi nav ji wan re jî digotin *Încîl*, derketine holê. (Weke mînak, jixwe “*Încîla Barnaba*¹⁶”)

Ji van re *Încîlê* “Apokrifal,” ango “yên ku rastiya wan nayê qebûlkirin,” “sextê¹⁷” tê gotin. Ger berhemên weha layiqî ku li gel beşên *Încîla* esil cîh bigrin bêñ dîtin an iddîa bêkirin ku ji *Încîlê* biqîmettir in, divê ev pirs ji xwediyê van iddiayan bêñ kirin: “Ev berhem di kîjan tarîxê de hatiye nivîsîn? Bi qasî *Încîlê* Kevin e? Gelo wek hemî beşên *Încîla* rasteqîn di sedsala yekem a P.Z de hatiye nivîsîn? Aya ji

¹⁶ “*Încîla Barnaba*”, ne ji aliyê Barnaba, ji aliyê yekî ku di heyama navîn de dev ji Xiristiyantîyê berdaye, Misilman bûye û han daye rastiya Misilmantîyê îsbat bike hatiye nivîsîn. Li ser peyv û termên ku di “*Încîla Barnaba*” de hatine bikaranîn ji aliyê zimannasan ve lêkolîn hatiye kirin û lêkoler gîhaştine encama ku “*Încîla Barnaba*” ya piştî Mesîh İsa bi 14 sedsalî hatiye nivîsîn bi tevayî sexte ye û ji aliyê dîrokî ve jî tu qîmetekî wê tuneye. Em ji xwendevanê ku bixwazin li vê mijarê bikolin re lêkolîna R. Benson a ku bi Tirkî hatiye nivîsîn, *Încîlî* Barnaba pêşniyaz dikin.

¹⁷ Ev *Încîlê* sexte yên ku di sedsala 2., 3., û 4. de hatine nivîsîn, tevlî ravekirina hin efsaneyên erzan ên di derbarê İsa de jî bi fîkrênesasî yên *Încîlê* re nakevin nakokiyê.

aliyê kesekî wek *Matta*, *Markos*, *Yûhenna*, *Luka*, Pawlos, Petros ku Mesîh Ìsa dîne an jî di eynî heyama yên ku ew naskirine de jiyaye ve hatiye nivîsin? Ci delîl hene ku mirov karibe baweriya xwe bi berhemê bîne ku piştî demeke kurt a piştî bûyeran hatiye nivîsin?” Gava ku DELÎL bêñ xwestin pirs zûka çareser dibe!

6. Încîl Ji Aliyê Xwedê Ve Çawa Hatiye Peyxamkirin?

Balkışandina ser ferqa di navbera nêrîna Misilmanan a di derheqê *Quranê* de û ya bawermendên Mesîh a di derheqê Încîlê de wê baş be. Hemî Misilmanen zana û otorîteyên Misilman, di derheqê fikra ku peyvên *Quranê* hemî ji alî melek Cebraîl ve, bi pêxemberê İslâmê Mihemed hatine nivîsandin , di *Quranê* de peyvên nemir ên Xwedê cîh girtine û weke çawa ku yeke din wek wê hertim li cinetê veşartiye, bi zimanê Erebî jî hete îro ji bo me veşartiye, hemfikir in. Eve, ev têgihiştina *Quranê* ya mutleq û teessûba wê û ev awayê nêrînê yê mutleq, ji ber ku bingeha esasî ya baweriya Mislimantiyê ye, him di heyama dîrokî û him jî di ya zanistî ya modern de jî, ji bo zanayên Misilman muhasebeyeke rexneyî ya *Quran* û çavkani an jî rasteqîniya wê dike tiştekî ku neyê hizirkirin. Hette, lê pirsiyaneyeke ciddî ya di derheqê rasteqîniya mutleq a *Quranê* de jî, wê karibe sîstema ku baweriya İslâmê li ser ava bûye tune bike. Ji ber vê ye ku, weke lêpirsîna

Ayetên Şeytanî, lêpirsîna çend ayetên din ên *Quranê* ji aliyê romanekê ve jî, ji aliyê karbidestên İslamî ve bi çavekî weke êrîseke li dijî imanê hatiye nêrîn. Ji ber vê yekê jî gava miftiyê Kevin Turan Dursun ji dînê İslâmê bêhêvî bû, wek karbidestekî Kevin ê Misilman, li dijî pêxemberê İslâmê Mihemed, piştî ku dest pêkir bi hezaran û bi awayekî vekirî nivîsên rexneyî nivîsîn, divê mirov li kuştina wî şas û mat nemîne. (*Binêre, Tabû Can Çekişiyor - Din Bu*, Weşanên Sistem, 1990)

Ger ev rexneyên li dijî *Quranê* rast bin, eşkere xwiya ye, imana Misilmanî, dikeve rewşa xaniyekî bêbingeh û ji aliyê ewlekarî û rastiya mutleq ve tiştekî wê yê ku xwe tavsiye bike namîne.

Ji aliyê din ve, nêrîna bawermendên Mesîhî (Xiristîyan) a di derbarê *Încîlê* de pirr cihê ye. Bingeha imana bawermendên Mesîh, ne li ser hebûn an rastiya *Încîlê*, li ser bingeha jiyana Mesîh İsa, mirin û piştî mirinê vejîna wî hatiye avakirin. Tu karbidestekî birêz ê Xiristîyan, baweriya xwe pê nayne ku peyvîn *Pirtûka Pîroz* ji aliyê şandiyekî ve jî be, ji aliyê Xwedê ve bi pêxemberên cihê cihê yeko yeko hatiye nivîsîn. Mijara ku hemî Xiristîyan li ser hemfikirin, ew e ku Xwedayê Mezin di heyamên cihê de, kesên bijarte yên ku li ser riya Wî çûne û dîroka têkiliya Wî û mirovayetiyyê nivîsîne, hilbijartine. Van kesan, di eynî wextê de, di bin tesîra Ruhê Pîroz ê Xwedê de, di derheqê ku divê em çawa bijîn û em ê çawa bi Wî re têkiliyeke ruhî û nêzîk deynin de fikir û fermanên cihê yên Xwedê nivîsîne.

Piraniya Xiristiyanê (ango bawermendê Mesîhî) ji dil, baweriya xwe bi wê tînin ku Xwedê tesîreke nexwezayî li nivîskarêñ beşen cihê yên Pirtûka Pîroz (ango *Tewrat*, *Zebur*, *Încîl*) kiriye û bi sedsalan ev nivîs parastine û bi vî awayî, dokumanêñ ewil ên nivîsên ku îro di destê me de ne, bi awayekî rast û rêk gîhandine ber destê me. Ji ber vê jî ji *Pirtûka Pîroz* re gelek caran “Peyva Xwedê” tê gotin. Li gel vê jî, hemî Xiristiyan qebûl dikin ku di nivîsên Pirtûka Pîroz de, di eynî wextê de hêmaneke însanî jî heye. Heta, Xwedê, bi tevayî bi alîkariya nîzama xwezayî ya li dînyê karkirinê dibijêre, ewende ku, tê bawerkirin ku *Pirtûka Pîroz* hêmanêñ însanî û yên pîroz li gel hev diparêze.

Divê em vê jî bêjin ku, tu zanayekî Xiristiyan an Musewî, fikra weke baweriya Misilmantiyê ya ku çawa Quran gîhaştiye Mihemed, *Tewrat* gîhaştiye Musa, Zebûr gihaştiye Dawid û *Încîl* jî gîhaştiye Îsa **qebûl nekiriye**. Heta Xiristiyanan hergîz bawer nekiriye ku Îsa tiştek nivîsî be û jixwe tu deflekkî vê yê dîrokî jî tuneye. Hemî dîroknivîs, li ser rastiya ku ev fikir (ango, fikra ku Îsa pirtûkek nivîsiye) piştî mirina Îsa bi 600 salî, bi Hz. Mihemed re derketiye navê, hemfikirin. Li gel hemî dîroknivîsên bêlayen, Xiristiyan jî, rastiya ku tenê Încîla Meşrû ya ku ji destpêka sedsala yekem ve hatiye qebûlkirin, ne ji aliyê Îsa ve, lê ji aliyê şagirtêñ wî ve hatiye nivîsîn, qebûl dikin.

Piştî ku me ev tişt hemî gotin, divê em dubare bikin ku *Pirtûka Pîroz* ji bo hemî Xristiyanan hîn jî pirr girîng e. Ev jî bûye sedemê ku *Pirtûka Pîroz* bibe pirtûka herî pirr bê

xwendin û wergerandin ser zimanê din. Xiristiyan bi vê yekê baş bawerin ku, çendî mirov *Pirtûka Pîroz* dixwîne û lêdikole, li ser bi awayekî kûr û dûr difikire û agahdariyên xwe pir dike, Ruhê Pîroz ê Xwedê jî, weke di mînakêñ dersêñ borî de bi mirov re bi awayekî taybetî dipeyive. Gellek baweriyêñ di derbarê Xwedê û rastiyêñ ku wê herûher xwe biparêzin, bitenê di *Pirtûka Pîroz* de hene. Ji ber wê û ji ber vê rewşa wê ya taybetî jî, Xiristiyanan han dane ku, metnê wê weke orjînalê wê bê wergerandin û nivîsêñ wê yên Kevin biparêzin. Weke ku gellek pirtûk û lêkolînan jî daye diyarkirin, wergerên *Pirtûka Pîroz* ên rojane, nivîsêñ ku bi destêñ pêxemberêñ cihê hatine nivîsîn, rast radîghînin.

7. Mebesta *Încîlê*

Încîl, ne bitenê ji bo ku li ser Îsa û kesêñ pêşîn ên li ser riya Wî zanyariyêñ dîrokî bide, hatiye nivîsîn. Di eynî demê de ji bo tesîra xwe bi awayekî pratîk li ser jiyana xwendevanêñ xwe ya rojane bike û ji bo wan teşwîqî bawerîpêanîñ û serîdanîna Reb Mesîh Îsa bike hatiye nivîsîn. Mirov lê şâş nabe ku çima kes û civatêñ ku tiştêñ *Încîl* fêr dike dixwînin, ciddî dibînin û tedbîqî jiyana xwe dikin, hete tu bixwazî hevdem, biîstiqrar, rêkûpêk û bextewer in.

Yek ji duwazde şagirt an şandiyên Îsa, Yûhennayê ku tiştên di derheqê beşê ku wî nivîsiye de gotiye, ji bo beşen ûnîlê yên din jî mirov dikare bêje.

“Béguman Îsa li ber şagirtan hê gellek nişanên din jî raber kirin ku ew di vê kitêbê de nehatine nivîsin. Lê belê ev hatine nivîsin, da ku hûn baweriya xwe bînin ku Îsa Mêsîh e, Kurê Xwedê ye û bi vê baweriyê jiyana we bi navê wî hebe.

(Încil: Yûhenna 20:30-31)

Hin çavkaniyêni di derbarê ewlebûna ûnîlê de hatine nivîsin ku mirov dikare wan li Tirkîyê peyde bike:

Benson, R. *Încil-i Barnaba: Lékolîneke zanistî*

Bruce, F.F. *Încil Bilim Serisi: Mesaja ûnîlê*

Cedid, İskender. *Tevrat ve Încil'in değişmezliği (Tewrat û Încil nayênu guhertin)*

Gilchrist, J. ve Lütçi Ekinci. *Evet, Kitabi Mukaddes Tanrı Sözü'dür! (Erê Pirtûka Pîroz Peyva Xwedê ye)*

Gilchrist, J. *Kur'an ile Încil Yan Yana! (Quran û Încil li ber hev)*

Karataş, Îsa. *Gerçekleri Saptıranlar (Mirovên ku rastiyê tahrif dikan)*

- Moran, M.A. *Hakikat ve Dalalet (Rastî û delalet)*
- Pfander, C. G. Tevrat ve İncil'de Tahrif Yoktur (Di Tewrat û İncilê de tahrîfat tuneye)
- Rhoton, Dale. *İnanç ve Kanit (Bawerî û Delalet)*
- Sproul, R.C. *İncil Bilim Serisi: Yorum Bilimi (Zanyariya şiroveyi)*
- Yazman, Yakup. *İznik Konseyi 'nde Ne Oldu? (Di Konseya Iznikê de çi bû?)*

KUPONÊ XWEDEVANAN

Xwendevanê hêja,

Ger weşana me bala we kişand an we jê îstîfade kir ev ê me pir memnûn bike. Hîn gellek kitêb û kitêbokên me yên wek vê hene. Ger hûn lîsteya pirtûkan an broşûra danasînê dixwazin, ji me re binivîsin. Ger pirsên we yên di derheqê baweriyê an mijarên girîng ên weke wê de hebin, em ê li hêviya nameyên we bin. Her xwendevanê me yê ku vê anketê dagire em ê jê re diyariyeke biçûk bişînin.

Anket-Ji kerema xwe çargoseyên pêdîvî destnîşan bikin.

1. We zimanê kitêba ‘Încîl Saxlem e’ çawa dît?

Hêsan Navendî Zor

2. Temenê we? Ji 18 salî biçûktir 18-25 26-40 Ji 40-î mezintir

3. Rewşa we ya perwerdeyî? Seretayî Navendî Lîse Bilind

4. Zayenda we? Keç Mêr

5. Rewşa we ya medenî? Bêkar Zewicî

6. Ez dixwazim hûn dersên kursa xwe ya Incîlê bêpere li ser navnîşana min rêkin? Erê Na

7. Ez dixwazim hûn lîsteya xwe ya pritûkan û broşura xwe ya danasînê lisir navnîşana min bişînin. Erê Na

Nav, Nasnav:.....

Navnîşan:.....

Bajar:.....

Jî kerema xwe rûpelî jê bikin an fotokopiya
wî bikşînin û bişînin navnîşana:

P.K. 8 Acıbadem Kadıköy - İstanbul

Încîl ci ye?

Încîla rastîn kîngê û ji

alî kî ve hat nivîsîn?

Peyxama Încîlê çawa çêbû?

Mesaj û armanca

Încîlê ci ye?

Pirsên bi vî awayî û gellekên din, ji alî pisporê Încîlê Prof. Dr. F. F. Bruce ve, di vê kitêboka ku di destê we de ye, bi awayekî zanistî têñ bersîvandin!

ISBN 975788990-3



9 789757 889908

480·2159